DERGEH

Sebîh Mihemed Hesen

Berî dergehqutana dûmahiyê çu hêvî li dev te peyda ne bûn, ku encamek bi destê te ve bihêt, û her berî dest bi vê hewê bikî, te gotibû hemûyan ku tu li hêviyê nînî ku tiştekê mezin bi dest xwe ve bînî, çinku ew ne cara êkê bû, tu karekê wesan encam bidî; belku bi dehan car bi dirêjahiya çendîn salan tu bûbû ye qehremanê gelek pirojeyên ne serkevtiyên hosan. Heger xwe carekê te encamek jî bi dest xwe ve anîbin, ew encam gelekê wextî bû!.

Carekê, hizreka hosan xwe li serê te da, kîjan baştir e, tu dergehên xelkê biqutî, yan xelk dergehê te biqute? Paşê te kire pirsyar, her bo pêkenîn, te arestey hevalekê kir. Heger sipêdeyê te dergehê êkê qutay xwedan derket, nîşanên westiyanê û xeweke ne xweş lê bûn, heger berê xwe da ye te bê ku çi bibêje girnijîneke xav û bêmane li ser lêvan çêbû, her êkser, tu têgehandî û dergeh girt, her weku gotiye te xwe pirsyara te çibe ez dê her bibêjim ne! Te gote xwe, ew jî zîrekiye êdî mirov pêdivî bi pirsyar û bersivan nebe. Belê carekê zelamekê pîr û bê serûber li te derket, demê te dîtî, te her xîret nekir hîç pirsyarekê jê bikî û heku te jê kirî jî her êkser bersiva wî tu hişk kirî:-

- Mamo, here pisyara hukumeta xwe bike. Hindî tu pirsyara yên wek min bikî dê her halê te ev be.Hema here, xwe min hebe jî, dê her bibêjime te ne! Te hizrên xwe kirin, tu evro zû bizivrî ye ve û te didilê xwe de got:-

- Hêşta, heta hîngê deh rojekên mayn, li beranberî te hindek zarokan li wê kelêja germê, tepanê dikir, viyaneke mizin tu palday tu jî pişikdariyê di gel wan de bikî. Belê careke dî, ev xelk e, weku dirindeyan hate berçavên te. Te di dilê xwe de got: Rast e ev (yê dî) ye ewê li beranber me, çu caran nahêle, em bo xwe çi bikin. Heku tu zivirî ye ve hemû di jor ve li hêviya te bûn û ewê çendê pêtirî hemû tiştan kerbên te vekirin. Gelek li dev te ya ne xweş bû, tu bizanî ev pirsyar e dê ji te hête kirin.(Ha te çi kir?!) Ev pirsyar e, te dikuje, te diviya kes deyneke heta tu rûniştî û te bêhna xwe veday, te gelek hizir dikir her êkcar nehatiba kirin!. Te nediviya bêjiye wan nîne belku bi rengekê wesa, te bersiv dida ku dengvedana wê weku bersiva pîremêrî be, lê te dizanî kes çi tê negehişt.

Heku careke dî êkî gotiye te belê me cih heye, gelek keyfa te hat belê gelek venekêşa heku pirsyar ji te kirî - Erê te zarok hene ?

Tu may heybetî bersivê bo vê pirsyarê ji kû ve bînî, xwe bersiva wî zelamê pîremêr jî li vê dirê feyde nake, heku tu gîro bûyî, te zanî ev delîve jî çu nemaye dê hête ji dest dan, te gotê:-

- Belê, min hene û rehetin.

Kire kenî û got:- Zarokên rehet li çu erdan nînin!

Careke dî jî zelamekê berketî û efendî li te derket, hem berê xwe da te paşê got:

- Mamo, hûn feqîr gelek bêhinteng in, pîçekê bêhna xwe fireh bikin, ev e dehên weku te dergeh qutan! Wê rojê te bi delîve zanî bi dewrê melayekî rabî, te tibla xwe kire di nav çavan re û tu xwerî.

Ev a bi serê me dihêt hemû binasên bênfirehiyê ne. Heger em jî bêhnteng bayîne dibe tinê gazinde bayne, me çu hêviyên dûr bo xwe ne çêkirbane, halê me jî ev ne dibû, behişt û cehnim jî li hêviya me ne dibûn.

Piştî te axavtina xwe bi dûmahî înayî, kerbên te gelek ji te ve bûn. Te diviya erd şeq bibe û tu biçiye tê de, vê behiştê û cehnimê bîra te û cirebirekê îna li navbera feqîrekê û zengînekê, li dûmahiyê yê zengîn kire kenî û got:-

- Mamo hewe feqîran behişt û cehnim yên çêkirîn da em ji hewe bitirsin!!

Heku pesna (hejar) dihate ber guhên te kêfa te dihat û te digot: Belku, ewê li vê derê li ser erdê hejar be dilê wan yê disojin. Ewên li hindav erdî û dergehekê bo li wê derî vedikin, belê carekê te navenîşanên pirtûkekê dîtin hemû hez û bîrên te serûbin kirin. "Hejar naçine behiştê" û li dû wê pirtûkê ev pênaseye bo mirovê hejar hate danan.

"Hejar ew mirov e ewê ku ne şiyay li ser dinyayê bo xwe çu bike, vêca şûna ku xwe bikuj e yan dîn bibe, hêviyek bo xwe çêkir û navê wê kire "Behişt".

Tiştê ji hemûyan nexweştir ew bû, ev pênaseye heta radeyeka mezin kete eqlê te û bû pişkek ji felsefeya te di jiyanê de... Carekê te viya xwedanê xaniyekê biceribînî û bo diyar bikî ku tu ne mirovekê hejarî, weku ew hizir dike, belku bi hindek layenên dî tu jî dewlemendî, te gotê:

- Erê ji bilî bersiva (ne) û (nîne) te bersiveke dî ji bo pirsyara min heye? û te pirsyara xwe ya caran, bo hebûna cihekê (mezelekê) jê kir, her berê xwe da te û bêhneka xweş nezanî çi bibêje, gelek kêfa te hat, çinku nezan û çawa bersiva te bide. Li roja dûmahiyê jî berî serê heyvê dergeh qutan ya berdewam bû. Bersiv jî hemû êk bûn.

Heku bûye serê heyvê û xudanû dergeh qutayî, ji bilî te hemû veciniqîn. Piştî çend rojan jî heku te cihek dîtî û bo demekê serê we rehet bûyî, dengê deriyê hewşa we hat, zarokekê ji hemûyan mezin tir lê derket, heku zivirî got:

- Bab, ev êk e yê pirsyara mezelkê dike!...